Herçî Evdîlqadirê Koyî di pey Xanî re û berî 50- 60 salî, gava temaşa dinyayê dikir û didît ko her tiştên dinyayê guhêrîne, û ji xwendinê re awayîne nû çêbûne û bi tenê bi xwendina medresan, berê Kurdan naçe serî, dinalî û digot:

Le dewrî ême roman û cerîde

Eger çî meqsede zimanî bawe

Belê Xanî digot (Bixwînin), Koyî li gora wextê Xwe, bi ser ve zêde dikir û digot: (Bi awayê nû bixwînin). Lê me nexwend, gelo çire? Ji ber ko mezin û bîrewerên Kurdan, menffetên xwe ên şexsî, di ser menffeta millet re girtine, ev milletê belengaz wek kerîkî pez, dane ber xwe, ew dotine..)

Gotinên Mîr Celadet Bedirxan rastin. Wî bi mebesta derçûna rojnameya (Roja Nû), gotarê bi navê (Merhele) nivîsandiye.. Wek ku diyare roja îro jî, em merheleyeke dîrokî û nû re derbas dibin û va berê serok Masûd Barzanî li Amerîka ye, Xwedê wî biwefiqîne û bi serketin li me vegeŕîne... Ez jî bi hêvî me ku, em di vê merheleya nû de yek dest bin, yek gotin bin û yek dil bin û li gor vê merheleya nû Kurdistan xwe ava bikin..

Rojnameya Roja Nû bi zimanê Kurdî û Firansîzî dihat weşandin, ji 4 rûpelan pêk dihat 3 ê rûpel bi Kurdî bûn û yek bi Firansîzî bû, ji hejmara 49 an û pêve hejmarek bi Kurdî û yek bi Firansîzî hatiye weşandin.

Tevî ku (Roja Nû) rojnameyeke siyasî bû, belê gelekî guh daye filoklor û çanda Kurdî, mirov dikare navê hin nivîskarên wê yên beşê Kurdî diyar bike ji bilî navê xwedîyê wê Dr. Kamîran Alî Bedirxan, ew jî ev bûn: Mîr Celadet Alî Bedirxan, Osman Sebrî, Cegerxwîn, Hesên Hişyar, Qedrî Can, Ehmed Namî, Mistefa Ehmed Botî.. **Konê Reş, Qamişlo, 03.05.2024**

**Diyarî ji bo xwendevanan****Kiye tu?**

*Cegerxwînê hesarî,  
herkes zane tu kiyê  
Tu helbestek kevnare,  
yezdan bo me ristiye  
Ji bo kurd û Kurdistan,  
tu xweş dost û xwediye  
Şah siwarê helbesta,  
tu nevîkî mîdiye  
te sînorên hêviyên me,  
bi awaza daniye  
Biçin çemê helbesta,  
tu deriya û kaniye  
Hek em gul û kulîlkbin  
Tu lîlav û xweliye  
Ez pir nadim pesnê te  
fermo bêje tu kiyê*

*Kanî li ku man dimyat û hetîn  
Ka Qedrî Şergo ka Selahedîn  
Contik û ecem tev bûne neyar  
Neviyên rêşard bûne dost û yar  
Çerxa felekê bê me digere  
Rewşa xebatê bê ser û bere  
Em mest û gêjin di nav bahoza  
Welat bû mêrga peyman û soza  
Lê dîsa em man kurdê serfiraz  
Dost û hevalên kesên aştxwaz*

*Rojhilat bûye lîztokek erzan  
Ketine taya xwe serok û rêzan  
Her perçak welat bûye deh perçe  
Serê me bûye wek bax û bexçe  
Hetka me gihîşt ta sînorê Hind  
Birc û kelat bûn kavil ji bo kund  
Em li cîhanê mane perîşan  
Ji bo bindestiyê em bûne nîşan  
Ma qey raste kurd hîna sêwiye  
Bêje Cegerxwîn bêje tu kiyê?*

**Mamoste. Ferhad Icmo**

**Dûmahî : Dr.Ebdilmecît Şexo : Rola kovara (Ronahî) di pêşketina çand û çapemeniya Kurdî de**

çîrok pê hatine gotin û piştî vê, dema ku bêje pir bûne û ziman pêşda çûye, ew gihaye koça dudiyar û meslok jê çêbûne, ji ber ku pirên meselokan bi qafiye dibin û hewceyî gelek bêjeyên yekdeng û yekbêjin, lê bê wezin û bê qafiye ye, paşê çaxa koka zimên gihaye Kuraniyê, wan helbest gotine û ji van gotinên me tete zanîn ko di pêşiya zimên de, berê çîrok hatine gotin û di pişt re metelok hatine gotin û li dawiyê Osman Sebrî şîretê dide kesên ko zimanê biyanî zanin, ko ew pir tiştan ji wan zimanan wergerînin zimanê Kurdî; ji ber ku bi vî rengî jî zimanê Kurdî kane pêşda here, yanê bi gîştî Osman Sebrî di vê gotarê de nirîn û agahiyên pir zanistî di warê zimanzaniyê de jî dide xwendevanên kovara Ronahiyê.

Sernivîser di bin navnîşana (hindik û rindik) vê agahiya jêrîn dide xwendevanên xwe, ew dibêje: Mirovê dinyayê yê herî dirêjtir li girava Eyslandê de ye; navê wî Con Pêterson e û bejna wî (2) Mitir û (52) S.M. in û ew bi (160) kilo giran e, heyst birayên wî hene, lê ew hemî di bejnên normal de ne, lê gava ew diçe Hotêlekê, ji wî re du textan dighînin hev, Pêterson artist e û ew di tiyatroke zarokan de dixebite.

Di hejmara (25) an de ev gotarên duhatî cihên xwe dîtine; 1-(Nêçîra kewan) Ebdilrehman Elî Yûnis. 2-(mîrovê ko simbêlên xwe di mezadê de firotin), Xelîlê Genco. 3-(dîroka jîna Napoliyon) Osman Sebrî. 4-(Pêtroyê sisiyan), Bişarê Segman. 5-(zêdehiya jinan), kovara (Ronahî). 6-(dîroka jîna Selahedîn), Osman Sebrî. 7-(Pêncî milyon ga û milyon û nîvek mîrov) Silêmanê Ferho.

E.E. Yûnis dibêje: Min pir kewedanî an kewgîrvanî di deştan û çîyan de kiriye, di aliyê Kurdistanê Bakur de bi çend awayî nêçîra kewan dibe 1- Kewvedanî: Divê kewgîrvan kewên xwe qenc xwedî bikin, êmê kewan jî ev in: Genim, gîyayê şîn, pîvaz û rojê carekê genim û çar, pênc caran şînatî, heyânî ko Şîbat biqede çav û nûkilên kewan sor dibin û av ji pozê wan tê, wê çaxê êdî wextê vedana kewê nêr e, hema çend roj ji Avdarê çûn, wê kewgîrvan kewên xwe hilînin û bi çol û çîyan bikevin û kewan vedin heyânê nîvê Gulanê û di pişt re, ewê dest bi vedana mêkewan jî bikin.

Vedana kewan: Kewgîrvan diçe li cîyekî mitik an pozik kozîkekê çêdike; dorhêla kozîkê bi hejikan an bi giya asê dike û bi çar alî de devan vedide, binî kozîkê jî kevir dike, lê gotarnivîs hîn pirtir û bi dirêjahî awaya nêçîra serên kaniyan û hemî gavên pêwîst ji bo awa kewan bi xwendevanên gotara xwe dide nasîn, bi rastî ev gotara jî nêçîrvanên kewan re pir balkêş e û ewa pir agahiyên pêwîst dide awciyên kewan.


Lê (Ronahî) di gotara bi sernavê (zêdehiya jinan) weha destpê dike: Ma zêdebûna jinan derdek e, ! Bi ya me be, ew ne derd e, ji berevajî wê, ew nihmetek e, lê ji bo xelkê Emîrîkayê û ji bo hin welatên Ewropayê ewa derdek mezin e û pîsporine civakî ji vî derdî re li dermanekî digerin, lê bivê, nevê; di dawiya vî şerî de, derd hêj (hîn) wê mezintir bibe, mêr heroj di qada şer de tene kuştin û li gora statîsteke ko beriya vî şerî hate belavkirin, di Emêrika de serê sedî (17) jin ji mêran bêtir bûn û ew nisbeta (rêjeya) heroj pirtir dibû, lewra pîspor li sebebana (sedeman) geriyar û wan ev sedemên jêrîn jê re dîtîn. -Hukumetê mihacereta (penaberan) mêran bend kiriye yanê; ewa nahêle xelkê xerîb (biyanî weke berê) herin Emêrikayê û ji xwe re xebatekê peyda bikin.

Piştê şerê (1914 -1918) an de di hemî dewletên şervanî de rêjeya mêran gelekî kêmtir bû, li gora statîstîka resmî (fermî) li welatê Uris; jin di sedî de (32) li Poloniya (38) li Êngilîterê (23) zêdebûbûn, lê li Firansa, Italiya û Almaniya ev zêdehiya di navbera (21 û 22) de bû, ji lewra ji niha de pîsporên civakî bi meselê mijûl in û ji vî derdî re li dermanekî digerin, lê tiştê ko tete bira me û ko ewa ji hemuyan rehetir e; ko xelkê Ewropa û Emerîka jî wek me Mislîmanan û li gor rêdana Pêxemberê me li şûna yekê (jînekê) ji xwe re çend jinan bînin û ev pîrsgirêka çareser dibe. Lê piştê (Ronahî) ev pêşniyara xwe pêşkêş kir, Ajansana Waşontone av pêşniyara daye zanin (ragîhand) û ev pîrs ji xelkê jî kirin: Gelo kîjan çêtir e, jin di navbera (21 -25) salan de wek mêran bibin esker yan hemû jinên ko jê xebat têt di paş eniyê de bixebitin, xelkê Emêrikî jî sedî (76) gotin: (Bila jin jî mîna mêran herin qada şer), yanê li dawiyê wek hate zanîn; pêşniyara desteya kovara (Ronahî) ji aliyên civakên ne Îslamî de ne hate pejrandin.

Lê Silêmanê Ferho jî di vir de û di bin navnîşana (pêncî milyon ga û milyon û nîvek mîrov) de mijara xwe dinivîse û ew dibêje: Li Emêrika heyamek hebû, 50 milyon gayên kovî dijîn, hîngê xelkê Emêrikî milyon û nîvek bûn, nijadê spî yê ko ji Ewropayê çûbûn Emerîka, rêhesin û avahiyên medeniyetê yê din jî hên çênekiribûn, xelkê goştê wan dixwarin ji kevelên wan cil ji xwe re çêdikirin, gayê Emêrikî xurt e, ji simên wî heta piştê wî şeş pê bilind in û qedere (10-12) peyan dirêj e, ji (1800) heta (2400) kilo giran e, kloçên wî ne ew çend (ewqa) direj in, lê ew gelek xurt in, mîrov dikane bi wan erdine hişk biqelêşe, ew hîn kane bi qilochên xwe hespekî û tev sîwarê xwe rake û bi sed mitrî jî bimeşe, hinek hebûn tenê zimanê wan dixwarin û yê mayên guran dixwar û carna ew tenê ji bo çermên wan dikuştin, wextê dest bi çêkirina rêhesinan kirin, hîngê di navbera gan û xelkê de şerekî nû çêbû, gan stûnên telêgrafan radikirin û diketin pêşiya Tirênê û bi xwe dihatin perçiqandin, lê Tirên ji rêkê derdixistin, qey ewan dizanin ko ev medeniyet (şaristanî) dê wê qirên wan bînin.

Di sala (1865) an de ji (50) milyon gayên kovî tenê (15) milyon mabûn û ew hêdî, hêdî kêmtir dibûn û çermên wan jî buha dibûn, li dawiyê di beyarên Emêrikî de ew pir hindik mabûn û HWD.

Li dawiya vê hejmarê sernivîser agahîyeke giring dide xwendevanên kovarê li Îraqê û ew di bin navnîşana: (wekîlê kovara me li Îraqê) de weha dinivîse: Wekîlê kovara me û herçî neşriyatên kitêbxana Hawarê ji bo Îraqê Mîrza Mihemed Ermexanî ye, ew li Musilê mamostê Kîmayê ye, em ji xwendevanên xwe yê li Îraqê hêvî dikin, ji ber hertiştî ko bi neşriyatên me eleqdar e, bila miraceetî Ermexanî bikin.

**Dûmahîk heye**

## Dr.Ebdilmecît Şêxo : Rola Kovara (Ronahî) di pêşketina çand û çapemeniya Kurdî de

**Rola kovara (Ronahî) di pêşketina çand û tevgera azadixwaza Kurd de Gotar di Ronahî de,hejmar: (23,24,25), xelek (6)**

Di hejmara (23) an de em dikanin van gotarên jêrîn bi nav bikin:1-(jin di eskeriyê de),sernivîser.2-(dîroka jîna Selahedîn)xelek:1-Osman Sebrî.2-(bo agahî),nivîsevan Ronahî.3-(Kurdistan,exbar elherb,Kanûna paşîn, 1944,hejmar(53)nivîsevan ne diyar e.4-(lehîstika Şetrencê),Cemîlê Tacdu.5-(dîroka jîna Napolyon 7),Osman Sebrî.6-(cêwîkên siyamî ên bi hev ve.)Smaîlê Serhedî.8-(Merîşal Lûksenburg)nivîskar ne diyar e. Sernivîser di gotara (jin di eskeriyê de) wêneyeke balefirê diweşîne û li derdora wê balefirê jin bi cilên fermî hene,gotarnivîs di vir de dinivîse: Piştî ku balefir vedigere benderê,jin wê teslîm dibin,wê paqij dikin,depoyên wê ji benzîne dadigrin û li hertiştê wê miqate dibin û di balefirê de texlîf sîwar hene; yên şervanî û yên ne şervanî hene, sîwarên wê yên ne şervanî jin in.

Lê ev peyayên ne şervanî jî dikevin bin barana bomban û gulan,gotarnivîs hîn dibêje:jinên Ewropayî ji her şerên berê bêtir kêkîlî şerî dibin û em Kurd divê li wan ecêbayî ne mînin,jî ber ku jinên me di şeran de jî arîkariya me dikin,ew li rex me rûdinin û tivingên me dadigrin.Sernivîser Celadet Bedirxan dixwaze di vê kurtegotarê de rola jinan di pêşketin û berxwedana civakê de li dijî neyaran bide naskirin û bi nimûneya jorîn jî wireyên jinên Kurd hîn bilindtir bike û rola wan jî ji civakê re bi zelalî bide nasîn.

Rêzazan û şoreşger Osman Sebrî di vir de kurtewergerekê jî zimanê Erebbî yê nivîskarekî Misrî Dr.Ehmed Bîlî li ser (jîna Selahedîn) bi Kurdî û bi pênc xelean di (Ronahî) de diweşîne û xelesa yekê di bin navnîşanên şaxî de:1-(çend pirs.) 2-(Selehedîn, gel û eşîra wî).Osman Sebrî weha dinivîse:

Kurd neTurk û ne jî Erebbî in,ew qewmekî(netewekî) Arî ne,Kurd di zemanên berê da li ser çiyane diyan û di navbera welatên Faris û Asiya biçûk da rûdinîştin,jinên wan jî mênên wan ne bi şûnda bûn,pir jin di nav Kurdan de bi gerandina şeran de bi navûdeng bûne,lê Kurd tu caran bindestiya biyaniyan ne dikirin,çiqaş qebîleyên Kurd hebûn,lê zimanê wan yek bû.

Osman Sebrî xwe hildipesêre ser cihderek dîrokî naskirî (da-îret me-arif el bistanî) û hin agahiyan li ser Selah -dîn Eyobî dide xwendevanên gotara xwe û ew hîn dinivîse:Eyobî malbetek e Kurd e ko Misir û Şam vekiriye û bi navê dewleta Eyobî hatiye nasîn,ev malbata jî malmezînen Kurdan e û jî qebîleya Rewadî ye. Dîsan sernivîserê kovarê di bin navnîşana(bo agahdarî) bi vê wateyê dibêje:Em desteya kovara (Gelawêjê)spas dikin ku ewa kovar û rojnameyên me di nav Kurdên Îraqê de propegende kirine û ewê bi vî awayî hevdu girtineke nijadî şanî me daye,lê desteya sernivîserê kovarê (Gelawêjê) weha jî nivîsiye:Ev herdu weşan bi zimanê Kurdî Botanî hatiye nivîsîn.Lê em jî bersiva Celadet Bedirxan di vê gotarê de têdighênin,ewî ne dixwast ku desteya kovara Gelewêjê bigota:Kovara(Ronahî) bi zaravê Botanî hatiye weşandin,ew hîn jî kovara(Gelawêjê) re dibêje:Zimanê Kurdî sê zaravên bingehîn in:1-Zarê Bakur.2-Zarê Nîvro.3-Zarê Dumilî û em jî zarê Bakur re dibêjin:Zarê Kurmancî û zimanê xelkê Botan Kurdî ye û zarê wan Kurmancî ye,yanê di vir de Celadet wek têtîniyekê arastî desteya kovara (Gelawêjê) dike.

Di kovara (Exbar-EI-Heleb) de ya ko Îngilîzan bi zimanê

Erebî li Misirê derdixist;hin agahî li ser Kurdistanê ji aliye desteya rojname de hatine weşandin;ewa di vir de dinivîse:Kurd di navbera heyşt û neh milyonan de ne,welatê wan di navbera Turkiyê,Îranê û Îraqê de hatiye lêk vekirin (parvekirin),birekî Kurdan di Sûriyê de û êline biçûk di deverine din de dijîn û Kurd jî nijadê Arî ne,rûyê erdê Kurdistana Îraqê bi qaserî Skoçlandê ye, li wir çiyane rût hene ko bilindiya wan dige heta (12000) peyî û hwd, lê bi gîştî kovar pir bi kurtî gelê Kurd û Kurdistanê bi xwendevanên xwe dide nasîn. Lê em di kovarê de jî kêmasiyeke mezin jî dibînin,em nizanin ko Celadet Bedirxan yan desteya kovarê xwe di ser vê rastiya dîrokî re avêtîye; jî ber ku di gotara kovarê de beşê Rojavayê Kurdistanê ne hatiye binavkirin,ango li nik desteya kovara (Exbar -EI-Heleb) ya ku li jor bi navkirî;Kurdistan tenê sê beş in û Kurdên Sûriyê penaber in,lê bi texmîna me sernivîserê (Ronahî) jî ber sedemên siyasî,nêrîna xwe ya rast di vir de ne deye û şaşiya kovara (Exbar -EI-Heleb) di gotara xwe de bi mebest û tektîk seraast ne kiriye.

Lê li aliyeke din; desteya vê kovara Erebbî pesna ciwanîya Kurdistanê dide û dibêje:Ayenda Kurdistanê xûya dike,Kurdistan di welatên (Rohelata Nêzing) de wê bibe îswîça (Swêra) Şerqê.

Herweha jî Osman Sebrî di vir de hîn li ser jîna Napliyon û şoreşa Firansî berdewam dike û pir hûrgilîyên pêvajoka şoreşa Firansî bi xwendevanên

kovarê dide nasîn û bi rastî mijara Osman Sebrî li ser Napliyon Ponapert bi nîrîna me kane jî dîrokanan re jî bibe lêvegerek zanistî û pêbawer kirî.

Lê di hejmara(24) ê de ev mijarên jêrîn hene :1-(jin û mên)Emoyê Cilînî,2- (jîna Napliyon Ponapert),Osman Sebrî.3-(gula Kirasdirhayî)M.Xidir Mizûrî.4-(dîroka jîna Selahedîn -2-).Osman Sebrî .5-(Gênêralê Emêrikanî an çawişê Talyanî)Hesenê Mistê.6-(hindik rindik),sernivîser.7-(ziman û nivîsandina wî)Osman Sebrî.

Li ser dîroka jîna Selahedîn de;Osman Sebrî dinivîse:Sultan Selahedîn ji hemî padîşahên Îslaman jêhatîr û bi navûdengtir bû,Selahedîn kurê Eyob Necmedîn di sala (1137) Z.de li keleha Tikritê hatiye dinê,bûyina Selahedîn rastî roja barkirina malbetê ji keleha Tikritê hatiye û herweha Osman Sebrî pir bi dirêjahî li ser jîna qehreman Selahedîn Eyobî radiweste ko ewî çawa Şam jî ji bin nîrê Xaçepersetan rizgar kiriye,herweha jî Osman Sebrî di vir de bi ferehî li ser hemû têtîniyên wî di bin ala îslamperestiyê de bi xwendevanên kovarê dide naskirin .

Lê dîsan Osman Sebrî di gotareke din û di vê hejmarê de li ser giringiya nivîsandina zimanê Kurdî radiweste û ew dibêje:Eger ziman kete warê nivîsandinê,ew hêdî ,hêdî mîna darê pel digre û ew paşê bi ber dibe û dema em zimanê xwe bi zimanên ko ketine warê nivîsandinê,wan bidin berhev,divê em sed salî pir ne bînin jî ber ko ziman ji bo miletan her tişt e, berî ko ziman têtîniyên warê nivîsandinê,ew sê koçan (merheleyan) derbas dikin,gava ziman nûn bûye wesîleya fehmkirinê û hevok jî çêbûne,di koça pêşîn




## Husên Hebeş : Rojbûna Celadet Bedirxan (26.04.1883-15.07.1951)

Îro rojbûna mîrê zanînê Celadet Bedirxan e. Xemxurê çanda kurdî û yek ji zevevên pêşdabirin û dewlemendkirina wê rêzdar Konê Reş îro ji min re kopiya nasnameya C. Bedirxan bi rêya Meta (Facebook) şand. Ew belgeheke fermî (resmî) ye, tê de rojbûna Bavê Cemşîd û Sînemê hatiye, ku ew roja 26ê nîsana 1893 ye. Vê mêjûyê arîşeyeke (kêşe, problem) mezin ji min re çareser kir, ku ji ez ji sala 1981ê de lêdigerim.

Dema min dest bi lêkolîna xwe ya doktora li ser kovara Hawarê li zanîngeha Lomonosov li Mosko di sala 1980 de destpêkir, min çî jêder bi cuda zimanan li ser jînenigariya C. Bedirxan dixwand, her sala bûyînê 1897 hatibû nivîsîn, ev yeka dihate dubarekirin ji Eladîn Sicadî , Mensûr Şelîta , Yosêf Melek de bigire ta digîhne Hemreş Reşo, ku wî agahiyên kurte jînenigariya mîr Celadet ji hevjiîna wî banû Rewşenê wergitiye, çawa ew di pêşgotina ji nû ve belavkirina hejmarên Hawarê 24-57 dinivîse.

Her Sadiq Behadîn di benda xwe ye portrêti li ser "Celadet Bedirxan" nivîsêye, ku li serê nîsana 1893an ji deya xwe bûye, lê ew sala nehatiye belgehandin ji aliyê nivesvan de.

Xwediyê Hawarê di sê minho yan de dabaşa jiyana xwe di kovarê de dike, berhema tevî giring ji wana li gor dîtina min „Were dotmam“) /Hawar, 18.tebaxê 1935/ ew benda di 18. Îlona 1934 de li Şamê hatiye nivîsîn. Di wir de ew dibêje, di derxika canê min de çil bihar bişkivîne. Piştî lêhûrbûnê li wê nivîsê ji min re dixuye, ku ew 1894 bûye. Tê bîra min, ku apê Qanatê Kurdo –



serkarê min – jî pir şabû bi wê lêkolînê \*. Ji îro de ti dililî li cem min nema li ser sala bûyîna Celadet Bedirxan a rastir endamê malbata min yê rûmetdar û li gel ew mezinên kurd û yên din li vê dunyayê bi berhemên xwe jiyânê li pêş min ronahîtir dikin û cuda asoyên hunerî û zanistiyê li pêş min ferehdikin.

Herweha ez dehrim rûyê dilsozê kurd yê resen Konê Reş di vê serdemê de, ku resenatî jar dibe .

Cejna rojbûna Celadet Bedirxan li gelê kurd pîroz be. Ew kesê mezinên xwe nenase, berhemên wan bi kurdî nexwîne, nikane bergiriyê li xwe û li gelê xwe bike, ew ji aliyên rewanî û derûnî de nîvpûç in, ew zû isparde û hindadibin. Mixabin ew bê rêç dicin, jiyîn û mirina wan wek hev e. 26.4.2024

- Bona bêtir zanînê binhêrin lêkolîna min ya bi sernavê „Raperîna Çanda Kurdî di Kovara Hawarê de“, ev yekemîn lêkolîna doktora ye di dîroka rojnamevaniya kurdî de, ku li ser wê tîtila PhD. Doktorê filosofi-yê di zanstiyên filolojîyê de hatiye wergirtin. Ta niha ew sê caran çapbûye û li ser daxwazên xwandevanê master û doktora ji Bakurê Kurdistanê min ew bi PDF jî di [www.drhasch.wordpress.com](http://www.drhasch.wordpress.com) belavkir

**Dûmahî : Li Azerbaycanê wêje û Ragihandina Kurdî**

Stembolê hatiye çapkirin. Li gorî agahdariyên rojnameger û nivîskar Hejarê Şamil, ji sala 1938ê he ta sala 1990î li Azerbaycanê bi tenê yek kitêbeke kurdî jî nehatiye belavkirin û çapkirin. Şamilê ku vê gavê li ser 'Ensîklopediya Kurdên Sovyetê' kar dike dibêje piştî sala 1990î bi qasî 'tiliyên du destan' kitêbên kurdî bi zaravayê kurmançî hatine weşandin.

Povêst(helbest)a "Bawerî" sala 1990, romana "Birîn" sala 1996-an da ji aliyê weşanxana "Azernesr"ê da bi tîraja tomerî hatîye weşandinê. Weşanxana "Genclik", pirtûkên wî yê bi navên "Karîbarên gelê Kurd" di sala 2000, "Hêsirên xûnê" di sala 2002-an da bi tîrajeke mezin va çap kirîye. Povêsta helbestvanê gelê Azerbaycanê Suhrab Tahîr ya bi navê "Du evîn, du gulle" wergerandîye zimanê kurdî. Romana "Birîn" (2005), povêsta "Rêwîyê bê mal" (2006) li Kurdisana Başûr bajarê Hewlêrê da hatîye weşandinê. Ehmedê Hepo 'Bi gazin im dinya' ya Qadirê Motî (1993), 'Ku da herim' a Bariyê Bala (1993), 'Pirtûka Azerbaycanî-Kurdî ya Axaftinê' (1994) û 'Alfabe' (1996) ya Bayremê Fetî 'Ferhenga Kurdî-Azerbaycanî, Azerbaycanî-Kurdî û Mişarên zimanê Kurdî' ya Şamil Esgerov (1999) çend berhemên giranbiha yên Kurdên Azerbaycanê ne.

**Rola Beşe Kurdolojiye ye Akademiya Azerbaycane:**

Di navbera salên 1960- 1970yî de di 'Beşe Kurdolojiyê yê Enstîtuya Zanistên Rojhilat a Akademiya Azerbaycanê de xebatên mezin hatin kirin. Di wan salan de zanyar, zimanzan û wêjevanên bi navê Elî Galawêj, Rehîmê Qazî, Hûseyin Kurdoglu, Şamil Esgerov, Zûmrûd Şefiyeva, Mûhammed Şemsî xebatên kurdolojî û wêjeyê meşandine û di demeke kurt de berhemên xwe afirandine. Di bin banê Beşe Kurdolojiyê de; M.Î Şemsî li ser 'Şerefname' ya

Şerefxanê Bedlîsî, Hûseyîn Kurdoglu li ser berhemên Abdûlla Goran, Şamil Esgerov li ser helbestvaniya Cegerxwîn, Zûmrûd Şefiyeva jî li ser mijara 'di helbesta kurdî de destan' kitêb û makale nivîsandine û ev berhemên wan îro ji bo lêkolînerên Kurd bûne çavkaniyên bêhempa. Şayanê gotinê ye ku rewşenbîr û nivîskarên mîna Ezedîn Mûstefa Resûl, Kemal Mezher, Nesrîn Fexrî, Rehîmê Qazî û Kerem Amoyev tezên xwe li heman akademiya amade û pêşkêş kirine.

Sala 1959ê, bi xebatên hêja yên rewşenbîrên Azerbaycanê, bi navê 'Kurd Edebiyati Almanagi' ango 'Berhevoka Edebiyata Kurdî' hate çapkirin. Di vê kitêbê de berhemên 9 şair û nivîskarên Kurd hebûn ku li zimanê azerkî hatibûn wergerandin. Li hêla din 'Mem û Zîn' a Ehmedê Xanî, du berhemên Evdîrehman Hejar û Eliyê Evdîrehman û kitêbeke ku ji helbestên şairên Gurcistanê pêk dihat, li zimanê azerkî hatin wergerandin û çapkirin.

Kurdên din ê ku li ser edebiyata kurdî xebat kirine Nofel Edalet û Hêjar Şamîl e. Van her du kesan li derveyî akademiya xebatên xwe yên şexsî li Azerbaycanê kirine. Nofel Edalet di sala an de pirtûka bi navê "Kurtenêrînek li ser Edebiyat û Çapameniya Kurd" bûye yekem kesê ku li Azerbaycanê kareke wisa kiriye. Wî di berhema xwe de qala gelek nivîskar û helbestvanê kurd jî kiriye.

Li jorê tê xuya li Azerbaycanê xebatên li ser edebiyat û çapameniya kurdan ciheke girîng digre. Beyî ku derfetên wan hebin kurdên Qafqasyayê yên ku her tim di bin xetereyê mezin de dijiyan berhemên gelek hêja dane û xebatên gelek taybet ji kurdan kirine. Me jî heya ji destê me hat bi kurtasî xwest ku em qala wan bikin di vê gotarê de.

**Jêder: Malpera Çandname**

**Dûmahî : Li Azerbaycanê wêje û Ragihandina Kurdî****Rojnameya Dengê Kurd:**

Rojnameya "Dengê Kurd" di sala 1992 de li devlata Azerbaycanê de tê weşandin. Ev rojname organê "Navende Çanda Ronahî" bûn. "Dengê Kurd" bi sê zimanî weşana xwe dikir; Kurdî, Azerbaycanî û Rusî. 23 salên tê weşandin û nêzî 100 hejmar hatiyê weşandin.

Ji ber sedemên aborî demeke kurt weşana xwe domkiriye. Di sala 1994an de ji ber sedemên siyasî damezrinerê rojnameyê Hejarê Şamîl, Kamiz Cemal, Adilê Cemal Azerbeycan derikandine. Piştî mirina Kurdnasê navdar Şamîl Askerov rojname weşana xwe ya asayî nikare bike. Di sala 2010 de bi saya xebatên Nofel Edalet û Seymur Alxanovun rojname heya sala 2013an de meha carekê weşana xwe dike. Lê dijberiyên din ava Navenda Çanda Kurd "ronahî" û edîtorê rojnameyê û ew pêkutiyên siyasî yên li ser rojnameyê dibe sedem ku dawiyê li weşana xwe bîne. Piştî vê yekê tenê hejmareke vê rojnameyê tê weşandin.

**Rojnameya Dîplomata Kurdî:**

Rojnameya Dîplomata Kurdî di sala 2003an de ji hêla rojnameger û nivîskarê kurd Tahîr Suleyman ve tê damezirandin. Tahîr Süleyman hem edîtorê rojnameyê ye hem jî xwedîyê wê ye. Rojnameyeke civakî û siyasî ye. Rojname di heftê carekê dertê. Bi zimanê kurdî, tirkî, azerî û rusî weşana xwe dike. Di derbarê jîyan û civaka kurdan de agahiyên dide. Heya niha jî weşana xwe domdike. Di rojnameyê de gelek nivîsên li ser çanda û hunera kurdî hene. Lê li ser rojnameyê pêkûtiyên siyasî hene. Rojname beyî ku alîgiriya partiyekê bike diji bo doza kurdan tédikoşe. Rojname di nava kurdên Azarbeycanê de gelek tê nasîn. Di derbarê bûyerên siyasî yên Kurdistanê de yekem rojnameye ku li Azarbeycanê dertê.

**Li Azerbaycanê edebiyat kurdî:**

Dîroka kurdên Qafqasyayê digîhije hezar salî. Lê tesîrên derve û polîtîkayên asîmilasyonê wisa kiriye

ku ev gel di nava gelên din de winda be û here. Her çend wisa be jî nivîskarên kurd qala çanda wan kiriye û niha jî kêmbê jî di romanên xwe de qala kurdan tê kirin.

Li gor ku em zanin dîroka nivîskarê kurdên Qafqasyayê ji dewleta Şeddadiyan destpê dike. Yek ji wan kesan jî Mesud îbnî Namîdar e û ew ji dewlata Şeddadî ye. Di qirnê 12an jiyaye. Ev yek heya nivîskara kurd Heyran Xanima Dunbulû tê. Lê heya serdema wê edebiyata kurdên Qafqasyayê di bandora edebiyata fars û ereban de bû. Berhemên xwe bi wan zimanan nivîsandibûn.

Di sedsala 19. de perwerdehî li Qafqasyayê pêş dikeve. Kurd jî bi zimanên gelên din ên Qafqasyayê kîtabên xwe dinivîsîn. Di salên 1930an wir de em dibînin ku êdî kurd bi zimanên xwe dinivîsîn. Li Ermenistanê "Riya Teze", li Azarbeycanê "Kurdîstana Sovyetê" bi zimanê kurdî dest bi weşanê dikin. Bi saya vê nivîskarê kurd jî mela xwe didin li ser kurdî. Lê di salên 1937an pê de Sovyet dest bi qedexeyê û surgunê dikin. Kurd jî aliyê çandî û jîyanî de di bandora vê polîtîkayê de dimînin. Di vê serdemê de kurdên sosyalîst ên navdar Suleyman Rehîmov û Elî Veliyev ji ber neçariyê zimanê bi Azerî berhemên xwe didin. Lê dijberî vê polîtîkayê kesên ku zimanê xwe jî dinivîsin heye. Yek ji wan jî helbestvan û kurdolog Şamîle Selîm, helbestvanan Qadirê Motî, Bariyê Bala û Ehmedê Hepo ye. Ehmedê Hepo nivîskarekî yekemîne ku Azerbaycanê dijî û zimanê kurdî dinivîse. Di 10-15 salên destpêka Sovyetê de li Azerbaycanê li ser Kurdan û bi zimanê kurdî 27 kîtêb hatine çapkirin. Ji bilî 'Fêkiyêd Aprêlê', kîtêba bi navê 'Azerbaycanskiye Kurdi' ango 'Kurdên Azerbaycanê' sala 1932yê bi zimanê rûsî li Bakûyê ronahiyê dibîne. Ev kîtêba dîrokî ji hêla Hejarê Şamîl ve li zimanê tirkî hatiyê wergerandin û sala 2009ê ji hêla 'Weşanxaneya Pêrî' ve li

## Li Azerbaycanê wêje û Ragihandina Kurdî



Kurdistan sor di navbera salên 1923- 1929ê de li ser xaka Kurdistan Qefqasyayê ku dikeve navbera Azerbaycan û Ermenistana îroyîn, bi fermana Sovyeta Sosyalîst temenê xwe berdewam kiriye. Li vê herêma Kurdistanî, di navbera 6-7 salên destpêkê de bingeha karên çandî, hunerî û edebî hatiye danîn. Divê bê gotin ku ev xebatên bi vî rengî heta salên 1937-1938ê berdewam kirine. Di wan salan de li bajarê Şûşayê li 'Teknîkûmê' ango li 'Dibistana Bilind a Pîşeyî' 'Fakûlteya Perwerdekirina Mamosteyên Kurdî' hate vekirin. Salek beriya wê jî li Yêrevana Ermenistanê teknîkûmeke ji bo heman armancê hatibû vekirin. Ji bilî teknîkûmê, li bajarê Laçînê bi navê 'Tîyatroya Gel' tîyatroya kurdî hatibû avakirin. Vê tîyatroyê li gellek deveran hunera kurdî pêşkêşî niştecihên herêmê dikir.

#### ROJNAMEGERIYA KURDÊN AZERBAYCANÊ :

Di Azarbeycanê de dîroka rojnamegeriya kurdî di sala 1931an destpê dike. Di sala 1931an de rojnameya yekem Kurdistan Şurevî dest bi weşanê dike. Piştî vê yekê di sala 1992an de "Dengê Kurd" di sala 2003an de "Dîplomat" dest bi weşanê dike. Her çend dozek hebe ku dibêje rojnameyeke bi soranî piştî hilweşîna Komara Mahabbadê ji hêla ew kesên ku li wir hatine hatiye weşandin hebe jî di derheqê vê yekê de agahî nehatine dest xistin. Di sala 1947-1950an de qala derketina vê rojnameyê

tê kirin. Ji ber ku bi tîpên erebî hatiye weşandin din ava gel de nehatiye pejirandin û di çavkaniyan de em çav bi vê rojnameyê nakevin.

#### Yekem rojnameya Kurden Azerbaycane Kurdistan Sovyete:

Rojnamayê "Kurdistan Sovyete" di sala 1931an de Serbajare Kurdistan sorê li Laçînê de weşandin. Navê wê ya pêşî "Şura Kurdustani" yanî "Lîjneya Kurdistanê" bû. Ev rojnama du zimanî, Kurdî û Azerî hatiye weşandin lê sala 1938 de çapê zimana kurdî hatiye gedexe kirin. Duyemîn Rojnameya ku zimanî kurdî tîpa latînî tê weşandin. Het da Rojanamaya "Kurdîstana Sovêta" di 1961 te weşandin. Navê rojnameya "Kurdîstana Sovêta" 1961 de de guhertin navê rojnameya dibe "Laçîn". Ev rojname Wekî organa lijneya rêvebirinê ya bajêr ji desteya kedkarên parlamentan ya Rêxistina Navçeya Laçînê ya partiya komînîst a Azarbeycanê ve hatîyê derxistin. Armanca derxistina vê rojnamê di nava Kurdan de belevkirina îdolojyeyê sovêtê bû. Yekem sernîvîskara rojnameyê Sîlêyman Rehîmov bû. Sîlêyman Rehîmov mezunê yekem yê beşa Kurdo-lojîyê ya ênîstûtûya Şûşa yê bû. Sîlêyman Rehîmov nîvîskareke navdar ê sovêtê bû. Ew Kurd bû. Îro haman rojnamê wekî organa lijneya sîrgûnbûyî ya Laçînê tê weşandin. Lê derheqê kurdan de tiştêk nayê nivîsîn.

# Herdu partiyên "Pêşverû - Yekîti" Cejna Rojnamegeriya Kurdî li Helebê vejandin



Sed silav li gyanê Mîr Miqdad Midhet Bedirxan  
Em pêşketinê ji xebata Rojnamegeriya Kurdî re dixwazin

Rêxistinên herdu partiyên li Helebê  
Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê.  
Partiya Yekîti ya Demoqrat a Kurd li Sûriyê (Yekîti).



Di êvara / 22 / 4 / 2024an de rêxistina Helebê yên herdu partiyên "Pêşverû - Yekîti" cejna "Rojnamegeriya Kurdî" li hola (Dîmena Helebê) li taxa (Şêxmeqsûd) vejandin.

Di ahengê de hevalên rêxistina Helebê yên herdu partiyên û nûnerên partiyên siyasî yên li herdu taxan , hevserokatiya Malbenda Helebê ya Rewşenbîrî , sazî , komele , rêxistinên civaka sivîl , rewşenbîr û hejmarek ji kesayetiyên welatparêz û cemawerê gelê me beşdar bûn.

Ahengê bernamêya xwe bi xulekek bêdeng li ser gyanê mîr Miqdad Midhet Bedirxan û pêşengên rojnamegeriya kurdî û hemû pakrewanên Kurdistanê , di ber sirûda netewî ya kurdî "Ey Reqîb" re destpêkir.

Di ahengê de gotina Rêxistina Helebê yên herdu partiyên "Pêşverû - Yekîti" bi Zimanê Kurdî hat xwendin , û peyamek pîrozbahiyê ji aliyê desteya sernivîser a rojnameya "Yekîti" hate xwendin.

Piştê Mamoste Hişmend Şêxo Endamê Komîta Navendî ya "Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê" Waneyek bi Zimanê Kurdî di derbarê "Rojnameya Kurdistan û Rojnamegeriya Kurdî" de ji beşdaran re pêşkêş kir.

Wane li ser Pênc beşan hate parvekirin :

- 1- Pêşgotin û rola ragihandinê di jiyana tevgera rêzanî û xebata demoqrat û aştiyane de.
  - 2 - kurtenasînek li ser Rojnameya Kurdistan.
  - 3- Qûnaxa Îzgehê û Radyoyên Kurdî.
  - 4- Qûnaxa sêyem ji ragihandinê desthilata ezmanî ya kurdî.
  - 5 - Nirxandinek li ser rewşa ragihandina kurdî di vê demê de û çawaniya pêşketina ragihandina kurdî.
- Piştê deriyê gotûbêjê û pirsan hate vekirin û bersivên beşdaran hatin dandin.  
Piştê hunermendê Efrînî Ekrem Bavê Nazî hejmarek ji saz û awazan kelepûra kurdî pêşkêşî beşdaran kir.  
Di dawiya ahengê de herdu partiyên spasiya dost , heval û mêvanan kirin ji bo beşdarbûna wan di vejandina vê bîranîna netewî de û hêviya serkeftinê ji her kesî re xwestin.

25 / 4 / 2024 Z - 2636 K

Rêxistina Helebê yên herdu partiyên  
Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê - Partiya Yekîti ya Demoqrat a Kurd li Sûriyê (Yekîti)



Min digot qey tu bi zimanî  
Ma tu bi kurmancî nizanî

CEGERXWÎN

## Çîroka Şaneder Z, jina ku 75 Hezar sal berê li Kurdistanê jiyaye

Lêkolînerên Birîtanî karîne rûyê jineke (Neyandertal) li Kurdistanê bibînin, ku nêzî (75) hezar sal berê jiyaye . Kelexê wê jinê ji aliyê şûnwarnasên (Arkeologên) zanîngeha "Cambridge" ve di nav şikefta Şaneder de hatiye dîtin û navê (Şaneder Z) lê kirine. Li gorî lêkolînan, dema (Şaneder. Z) miriye temenê wê 40 salî bûye û ev keşf ji bo lêkolîna li ser mirovên Neyandertal destkeftê zanistî girîng tê zanînê. Di laboratuvara zanîngeha (Cambridge) de û bi alîkariya Du hunermendên Holandî,

şêweyê rûyê (Şaneder Zed) hatiye dîtin û bi şêwazê 3D hatiye nîşandan. Çîroka "Şaneder Zed" û keşfê herî dawî yê di warê Neandertalan de li ser Netflix-ê bi navê (Veşartiyên Neanderthal) belgefilmek hatiye çêkirin. Şikefta Şaneder dikeve navçeya Mêrgesorê ya ser bi parêzgeha Hewlêrê ya Başûrê Kurdistanê. Ku li ser çiyayên devera Bradostê û ev şikeft dîroka wê vedigere bo serdema kevirîn ya herî kevin berya 80 hezar sal pêş zayînê. Hêjayî gotinê ye ku sala 1997 peykerê zarokê li şikefta



Dûderî ya Herêma Çiyayê Kurmênc (Efrînê) ya Rojavayê Kurdistanê hate dîtin ku dîroka wê vedigeriya bo 80 hezar sal berya zayînê û navê (Zarokê Dûderî) lê hat kirin. Ku ji aliyê kompaniyeker Japonî û frensî ve lêkolîn tê de hatine kirin. Eve jî nîşana wê yekê ye ku Kurdistan lendika şaristaniyetê ye mirovatî li ser vê axê destpê kiriye.

Jêder : XELAT/ Kurdistanî Nwê

## Bi giyan û vîna Rojnameya Kurdistan Em xebata xwe dikin

Bi helkefta cejna karkerên Cîhanê Desteya sernivîser a Rojnameya Pêşverû Yekê Gulanê li tevahî karkerên Kurdistan û Cîhanê pîroz dike û serkeftinê ji wan re dixwaze.

1 / 5 / 2024 Z - 2636 K



*Desteya sernivîser a Rojnameya Pêşverû*

*Rojnameya Pêşverû Dengê milletê kurd e  
Dengê Partiya Demokrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê ye*



Rojnameyêke Mehaneyê ji Aliyê Nivîsgeha Ragahandina Efrînê ya Partiya Demokrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê Tê weşandin Hejmar (79) Gulan 2024 Z - 2636 K

Dengê Pêşverû

Yazde sal di ser Rojnameya Pêşverû re

Piştî derbasbûna salekê di ser qeyrana Sûrî re rewşa gelê kurd û tevgera wî ya rêzanî û rewşa herêmên kurdî derbasî qûnaxeke din bû, herwiha bandorên neyênî yên wê qeyranê hêdî hêdî li herêmên kurdî jî xuya kirin wek qutbûna çûn û hatinê û girtina rêkê di navber Efrîn , Heleb û herêmên kurdî de û qutbûna kehrebe û alavên pêgihînê , van sedeman zehmetî di gihandina ragihandina partiyê de li seranserî herêmên kurdî peyda kirin , û ji ber pêwîstiya karê rêzanî û xebata partîzanî serkirdayetiya Efrînê ya "Partiya Demokrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê" biryarek standin bi derxistina "Rojnameya Pêşverû" Di Gulana sala 2013an de hejmarê Yekem ji Rojnameyê bi derket û ket nav destê dost û hevalan. Rêketa "Rojnameya Pêşverû" dergeheke nû ji nerîn û derbirînê re vekir û hêviyên dost û hevalan di xebata partîzanî de bilind kirin û bi germahî xwendevanên wê pêşwazî dikirin , rûpelên wê dipelandin û bi hûrbînî mijarên wê yên cihêreng û dagirtî dixwendin

Di destpêkê de ew ji heşt rûpelan pêk hatibû Heft rûpel bi Zimanê Erebi û rûpelek bi Zimanê Kurdî bû. Piştê hêdî hêdî firehtir , geştir û zengîntir bû. Ji sala 2015an de heya bi vê keliyê "Rojnameya Pêşverû" jî Bîst rûpelên dagirtî dikeve nav destên xwendevanên xwe. Naveroka wê ji Nûçe , Gotar , Hevpeyvîn , Kesayetiyan hejmarê , Rewşa jina kurd , Dîrok , Çand , Fêrkirin û rastkirina zimên , Peywendiyên Kurdistanî , Belge , Efrîn di bin dagîrkeriyê de , pirtûka hejmarê , û Doza Kurdî di Rojnamegeriya Cîhanî de... hwd

"Rojnameya Pêşverû" bi rêbaza xwe ya rêyalîst û hişmend , bi wê logoya xwe ya kesk ku reng ji rengên keskiya zêtûnên Çiyaye Kurmênc û xwezaya Kurdistanê hemerengî daye xebata ragihandin û pirtûkxaneyê kurdî. Hêjayî gotinê ye ku derxistin û çapkirina Rojnameya Pêşverû li Efrînê bi derdiket û (3000) kopî dihat çapkirin û belavkirin. Lê piştî dagîrkirina Efrînê ew demêke kurt hate rawestandî û piştê ji ber rewşa awarte ya ku li herêma Efrînê û ji ber girîngiya wê di nav hevalên rêxistina Efrînê de nivîsgeha rêzanî û serkirdayetiya partiya me biryar dan ku divê "Rojnameya Pêşverû" rêveçûna xwe berdewam bike û ji wê rojê de heya bi vê keliyê "Rojnameya Pêşverû" di xebata xwe de berdewame û rolekî wê pêşeng û çalak di nav ragihandina partiya me de heye.

Desteya Sernivîser a Rojnameya Pêşverû

Dr. Ciwan Hemê: Bo min xelata `BILE` ji ya Nobelê mezintir e

Roja sêşemê 23/4/2024 di merasîmeke mezin de li bajarê Silêmaniyê xelata zêrîn ya BILE ji aliyê Serokê Yekîtiya Nîştimanî ya Kurdistanê Bafil Celal Talebanî ve pêşkêşî Dr. Ciwan Hemê hate kirin. Ew merasîm jî salane ji aliyê Saziya Îbrahîm Ehmed ve birêve diçe û çendîn kesayetiyan diyar ji hemû parçeyên Kurdistanê tî xelat kirin.



Dr. Ciwan Hemê ji rojnameya "Kurdistanî Nwê" re dibêje: Xelata Zêrîn ya BILE ji bo min gelekî ji ya Oskar û Nobelê giringtir û mezintirê çûnkî rewanaşad Îbrahîm Ehmed kesayetiyeke bi nav û bang û mezin yê Kurde û li ser rêbaza kurdayetiye û xweşewîstiyê li kêleka êş û azarên netewa Kurd bûye li her çar parçeyên Kurdistanê.

Dr. Ciwan gotiye jî: "Gotinek heye dibêje daku tu bibe pizîşkekî (doktorêkî) baş pêwîste tu şeş salan li zanîngeha beşa pizîşkî bixwîne û nêzikî 60 pirtûkên taybet di ware pizîşkî de bixwîne û jiber bike, lê eger kurdek bixwaze bibe pizîşkî divê êş û azar û nexweşiyên gelê kurd bizane û bixwîne wê demî wê bibe pizîşkekî baş."

Di beşekî din ya axaftina xwe de Dr. Ciwan dibêje: Daxwaza min ewe ku rojê derfet hebe ez serdana Herêma Kurdistanê bikim, bi taybetî li bajarê Silêmaniyê ez serdana mezarê rewanaşad serok Mam Celal, Îbrahîm Ehmed, Mame Rîşe û Şêrko Bêkes bikim, çûnkî piştî wergirtina xelata zêrîn ya BILE erkê min girantir bûye, ev xelat jî nîşana wê yekê ye ku Kurdistan yek parçe ye.

Rojnameya Pêşverû



Ev Rojname Rojnameya we ye Ev Deng û Hawara we ye Zengîn bikin bi gotarên xwe Ev xewn û Hêviya me ye

Hişmend

E.Mail: altekedome-efrin@hotmail.com Facebook Efrîn